

Agahiyên li bara venêrîna daneyan

Venêrîna wêneyan bo armanca çavdêriyê

Li gorî madeya 13 û 14 ya Rêzikên Giştî yên Parastina Daneyan (DSGVO)

Nav û Hûrgiliyên pêwendiyê yên kontrolkarî:

Bundesamt für Fremdenwesen und Asyl (Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiyê)
Modecenterstraße 22, 1030 Wien
Tel: +43- 59 133 98 7004
Faks: +43- 59 133 98 7399
e-name: BFA-Einlaufstelle@bmi.gv.at

Hûrgiliyên pêwendiyê yên berpîrsê parastina daneyan:

Tel: +43- 59 133 98 - 0
e-name: BFA-Datenschutzbeauftragter@bmi.gv.at

Armanca venêrîna bo daneyên ferdî bi vê mebestê ye:

Wênegirtina nihênîdar ya ketina hundir herwiha devera gihîştinê ya avahiyeke îdarî bi saetên vekirî yên tenê bo koma qanûnî ya giştî wekî kontrolkar e, yan cihekî cuda yê ketina hundir herwiha devera gihîştinê beşeke cuda ya dorberê ya avahiyê ku bi awayekî ne-taybet wekî avahiya îdarî (wek mînak, nivê avahiyê, qatek) ji aliyê koma qanûnî ya giştî wekî kontrolkar ve bi kar tê, herwiha rûyê avahiyeke îdarî ya komeke qanûnî ya giştî wekî kontrolkara venêrîna wêneyan, yan kesên ku bo ziyana rûyê avahiya îdarî berpîrs tînin, bo armanca parastina milkê, jiyan û tenduristiya kesên li têkiliyê qanûnî digel rayedar lihevkar, pêşgirtin, kêmsînorkirin û çareserkirina her karê ihtimalî yên cinayî, heya wê derê ku berpîrsyariya rayedarên lihevkar rê dide, û tenê wê demê analîz dibin ku li gorî armancê rave bûne, herwiha heya ku madeya 12 ya Peymana Parastina Daneyan (DSG) destûrê bide.

Bingeha qanûnî bo venêrînê:

Madeya 12, 13 ya Peymana Parastina Daneyan (DSG); madeya 353 ff û madeya 1157 ya Qanûna Medenî (ABGB); madeya 3 ya Peymana Parastina Xizmetkarên Medenî yên Federal (B-BSG); madeya 80 ya Qanûna Rêbaza daraza Cinayetan ya 1975 (StPO).

Dirêjahiya dema ku agahiyên ferdî yê werin xwedîkirin:

Eger êdî ew bo armancên ku bo wan hatine girtin pêwîst nebin, di 72 saetan da pak dibin.

Desteya kesên daneyên ferdî werdigirin:

Rayedarê xwedanşert herwiha dadgeha xwedanşert (bo ewlebûna ji şahidên mijarên cinayî); navendên ewlehiyê (bo armancên asayîşî); dadgeh (bo ewlebûna ji şahidên mijarên cinayî); kompaniyayên sîgortayê (tenê bo çareserkirina daxwazên sîgorteyî).

Mafên mijara daneyan:

Heqê gilîkirinê li Rayedarên Parastina Daneyan a Avûstryayê (1030 Wien, Barichgasse 40-42, tel +43 1 52 152-0, e-name dsb@dsb.gv.at) li gorî madeya 24, benda 1 ya Peymana Parastina Daneyan bi kar tê (DSG).

Heqê dest gihîştinê li madeya 15 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê sererastkirinê li madeya 16 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê pakkirinê ('heqê jibîrbûnê') li madeya 17 ya DSGVO diyar bûye.

Tu heqê itirazê li gorî madeya 21 DSGVO tune ye û tu heqê kêmsînorkirina venêrînê li gorî madeya 18 ya DSGVO bo venêrîna daneyên ferdî li gorî Peymana Federal li bara Pêkanîna Muqate û Xizmetên Bingehîn bo Penahxwazan û Biyaniyên din ên Xwedanşert nayê pêkanîn